

Freie  
Demokraten  
FDP

# JI VIR BER BI PÊŞ

BERNAMEYA ME YA PÊŞVERÛ JI BO NRW.

JOACHIM STAMP



# **JI VIR BER BI PÊŞ. BERNAMEYA ME YA PÊŞVERÛ JI BO NRW.**


## **RABE BER BI WELATÊ DERFETAN.**

Nordrhein-Westfalen herêmeke bihêz e – bi FDP ber bi pêşketineke mezintir. Bi Demokratên Azad weke hêzeke serbixwe ya pêşverû ya rêya navîn ez dixwazim vê rêyê bidomînim.

Em hîn bêtir derfetan ji bo hemuyan biafirînin. Em piştgiriya her zîrekiyekê bikin. Bi baştirîn perwerdeya ku ji bo jiyaneke serbixwe amade dike. Em aboriya xwe bihêztir bikin: weke welatê afirîneriyê yê yekemîn, bi kêmtir burokrasî û bêtir piştgirîkirina ramanên nûjen. Em bixêrhatina wan kesan bikin ku ji bo me dibin dewlemendî – lê em tawankaran bêyî dudilî dersînor bikin. Weke civakeke vekirî divê em azadî û pîrr-rengiya xwe biparêzin.

Em Demokratên Azad dixwazin ji niha û pê de jî ji bo Nordrhein-Westfalenê berpirsariya hikûmetê li ser milê me bê. Em dixwazin NRW hîn azadtir, adiltir û dijîltir bikin. Çiqasî pêşverû, ew di destê we de ye.

Joachim Stamp



# AZADÎ ŞERTÊ BIVÊ-NEVÊ YÊ SÎSTEMÊ YE.

Ji 2017ê ve em li Nordrhein-Westfalen di berpirsyartinê de ne. Me gellek tişt bi dest xistin, lê hîn bêtir jî di bernameya me de ne. Em ji wê yekê piştrast in ku ya herî baş hîn li pêş me ye: Hîn bêtir derfet ji bo hemû kesan. Em dixwazin herêma xwe hîn azadtir, adiltir û moderntir bikin. Em NRW hîn bêtir bi pêş bixin – bi bernameya me ya pêşverû!

# HEWCEDARIYA ABORIYÊ TINE BI BUROKRATAN. LÊ HEYE BI AZAD DEMOKRATAN.

NRW berê burokrasî diafirand, em şîrketan diafirînin. Ev rêya serketinê ye: Ji sala 2017ê ve aboriya me ya herêmî ji ya dewletê bêtir pêş ket. Bi vê yekê me derfetên nû yên kar, bêtir mecalên serketinên şexsî û dewlemendî afirand. Em vê rêyê bidomînin.

## Start-up motora pêşketinê ne.

Dermaleya (bûrs) avakirinê tiştê berbiçav kir: Ji ramanên bi rastî baş, şîrketên bi rastî baş tî avakirin. Armanca me: Em weke welatê afirîneriyê yê yekemîn hîn bêtir pêşkevin.

## Pêşeroj ya kêmtir dûmanên jehrî ye.

Em dixwazin hîn bêtir piştgiriya teknolojiyên mîna hîdrojen bikin û bibin mînakê Pîşesaziya 4.0. Çûn û hatina elektronîk ji bo vê yekê kilîda pêşketineke mayinde ye. Ji bo welatê me û ji bo pîşesaziya makîneyan.

## Aboriya ne hemdem dewlemendiyê naafirîne.

Em rê ji şîrketan re xweş bikin ku bi asanî bi pêş bikevin. Ji bo vê yekê pêwîstî bi kêmkirina şert û mercan, pêşbaziyeke adilane û temînkirineke bi ewle ya enerjîyê heye.

## Kar û malbat, ne ew an ew.

Çavdêriya zarokan divê li gor jiyana dêbavan bê. Em rê-şêwazên nû berfireh bikin, ku li gor serdemê bin û ti cudabûnê nekin navbera dayîk û bavan – bo mînak wek karparvekirin (Jobsharing) û zarokxaneyên ku demên wan yên vekirî destûra karên vardî jî bidin.

# ZÎREKÎ LI DER HERÊ YE. EM LI HER DERÊ PIŞTGIRIYA WÊ BIKIN.

Zarokên me hêjayî wê yekê ne ku hemû derfetên vê dinyayê para wan bin. Ji me re dernakevê ku em zîrekiyeke veşartî paşguh bixin. Ev yek tenê bi perwerdeya herî baş gengaz e. Tiştê ku me bi dest xistiye, em dewam bikin. Em bêtir mesrefê bikin ji bo: nûtirîn teknoloji, bêtir mamoste, herwiha moderntirîn dibistan. Bila em ji bo ramanên nû vekirî bin, ku dihêlin her zarokek ji qama xwe mezintir bibê.

## Mecal li zarokxaneyê mezin dibin.

Peydakirina cihekî di zarokxaneyê de divê tiştê herî sivik li ser rûyê dinyayê bê. Em dixwazin bi salên bêtir ên bêpere barê malbatan siviktir bikin. Armanca me: Destpêkek û çavdêriyeke herî baş ji bo biçûkan.

## Çanteyên dibistanan yên zîrek tabletan hildigrin.

Ji bo her zarokekî divê tabletek an jî laptopeke hebê. Ji ber ku tiştên nû tenê bi rengên nûjen tên fêrkirin. Lê mesele ne tenê alav in, lê têgihîştine jî. Vîzyona me: Divê her şagirtê û şagirtê li NRW di dawiya dibistanê de aplîkasyonêk afirandibê.

## Mejiyê te giring e, ne taxa te.

Hîn bêtir baştirîn dibistan li wan cihan, ku pirsgerêkên civakî li wan herî mezin in. Bi 1000 dibistanên zîrekan li tevaya herêmê em piştgiriya hemû zîrekan dikin – bêyî ku xem bê, ka ew ji kû hatine û çawa mezin dibin. Herwiha pewîstiya her dibistanekê bi piştevanekî zîrekan yê taybet heye. Tenê bi vî rengî em dikarin rê li wê şiyane (qudret) vekin ku di her yekî ji me de ye.

## Fêrbûna ji bo jiyane, ne ji bo ezmûnan.

Aborî weke derseke nû li hemû dibistanan tiştek berbiçav kir: Dibistan dikarê bibê amadekarê jiyaneke serbixwe. Bi wê yekê ku em di pêşerojê de bêtir kesên pratîker dawetî dibistanan bikin, emê ji teoriya sar bêtir tiştan bigihînin şagirtan.

## Divê nixê hostetiyê wekê yê masterê bê.

Em derfetan ji bo jiyane biafirînin, ew jî bi rêya piştgiriya her cûreyekî dibistanan û her rêyeke xwendina pêşeyî.

## **MADAM DAPÎRA TE ONLINE E, DAÎRE JÎ VÊ YEKÊ DIKARIN.**

Em li benda pandemiyeke nû nemînin, daku em dijîtalalkirinê pêş ve bibin. Em ji hemû parêzgehan bêtir Daîreya Dîjîtal ya Pêşerojê pêş ve bibin. Her çiqasî kar online bên çareserkirin, hewqasî zû emê NRW pêş ve bibin. Ji ber vê yekê em dixwazin bikin mafekî qanûnî ku karekî daîreyên fermî bikaribe ji malê dijîtal bê çareserkirin. Ev yek tenê bi înterneteke herî bilez gengaz e, ku hemû mirovan û şîrketan li bajar û gundan heta sala 2025ê bi hevdu re girêdidê.

### **Bi xêr hatî pêşerojê.**

Em dixwazin qadên azadiyê yên dijîtal biafirînin û bi vê yekê hêza nûjenkirinê ya herêma NRW bihêztir bikin - bi taybetî di warên IT, Quantencomputing, Blockchain û Artificial intelligence (AI) de. Tenê bi vê yekê emê di qadên herî pêş yên cihanê de xwedî giranî bimînin.

## **EM ÇANDEKE VEKIRÎ JI BO AFIRÎNERIYÊ AVA BIKIN.**

### **Unicorns made in NRW.**

Lêkolînerên me yên gellekî baş û şîrketên me yên bihêz hene: Em mecalan mezintir bikin û wan herduyan bigihînin hevdu. Bi vê yekê wê gengaz be ku di pênc salên pêş de herî kêr 50 şîrketên nû yên ji patentên li vir afirandî ava bibin.

### **Xwezaparastin bi ramanên nû.**

Em rîyên nû bibînin, ku ji bo xwezayê û ji bo me jî baş bin. Jiyanêke bi ewle ne tenê bi veberanîna (envestîsman) di guhertinên tîkildarî klîmayê bi dest dikevê, lê bi wê yekê ku em bi afirandinên nû klîmayê biparêzin û bi kêmkirina karbondîoksîdê di aborî û pîşesaziyê de.



## **JI PÊŞKETINÊ RE NE XEM E, KA RAMAN JI KÛ TÊ.**

Bila em bibin welatê herî hezkirî yê karmandên xwendî yên ji derve – wek çawa Kanada jî dike. Em bixêrhatina hîn bêtir kêsên zîrek bikin, ji ber ku pîrr-rengî û zanebûn wê welatê me hîn bêtir bi pêş bixin. Lê li aliyê din jî emê li ser wê yekê rijd bin: Kî civaka me ya vekirî tehdît bikê û bi kar bînê, ewê bê dersînorkirin.

## **SIYASETA TRAFÎKÊ BEYÎ SÎNORKIRINA MEJÎ.**

Trafîk û mecalên hatûçûnê divê li gor pêwîstiyên mirovan bin, ne tersî wê. Hemû kes divê bikaribin bilez bigihijin qonaxa xwe - bi rengê ku dixwazin û heta ku gengaz be bêyî gemarkirina xwezayê. Ji bo vê yekê em dixwazin sîstema veguhestinê bihêztir bikin: Makîne, trêna, otobûs û bisiklêt. Ji ber ku li herêmên gundewar kesek nikare bêyî makîne bilivê. Ji bilî wê yekê, em dixwazin hatûçûna otobûsên ku bi bangkirinê werin berfirehtir bikin. Pêwîstiya otobûs û trênan bi sîstemeke asan û bilêtên dijîtal heye – ji bo ku her kesek bikaribê bi aplîkasyoneke telefona destan li tevaya NRW bigerê.

## **VEKIRÎBÛNA ME HEWCEDARÎ EWLEKARIYÊ YE.**

Azadî ne tiştek e ku hema ji xwe heye, lê bingeha civaka me ya demokratîk e. Têr nake ku tenê behsa nîrxên weke „ji her kesekî re singvekirî“ û toleransê bê kirin, divê em van nîrxan bijîn. Pêbaweriya bi dewleta dadperwerane jî ji bo vê yekê şert e. Bi bêtir polîsan, dadweriyeke bihêz, sîstemeke modern ya hawarçûnê û parastina ji karesatan, nexweşxaneyên baş û geşkirina karê xwebexş em maf û jiyana hemû welatîyan diparêzin. Û vê yekê ne tenê li ser kolanan, lê li ser înternetê jî.

## **HER MIROVEK DIVÊ BIKARIBÊ TIŞTEKÎ JI BO XWE AVA BIKÊ.**

### **Em bibin civakek milkdaran.**

Bi qanûneke ku baca kîrîna mal û milk heta dereceyekê neyê dayîn (meblexa azad) emê xeyala malbatên ciwan ya kîrîna malekê pêk bînin. Wekî din jî em dixwazin ku bi rêya kîrîna malên ku dewletê berê dane avakirin, bêtir kirêgir bibin xwedî mal û milk. Dewlet divê bibê rêveker, ne rêgir. Herwiha divê hedefa piştgiriya avadaniya malan zelaltir bibê, ji bo ku bêtir malên erzan yên ji bo kirêdanê bîn avakirin.

### **Em dikarin bajaran ji nû ve ava bikin.**

Plana me: Mîmar mecalên pêşketinê xêz dikin. Bi jîngehên ku her kesek karibê barê wan yê mesrefê rakê û sûdeke mezintir ji bilindahiyê werdigrin. Em standardên nû bi cîh bikin: Em „avahiyên berbîjorê“ ava bikin! Bi baştirîn mîmarî, avadaniya mayinde û perwerdeya nêzîkî malê.

## **EM GELLEK IN.**

### **Civaka vekirî ji pîrr-rengiyê dijî.**

Em niştecihên Nordrhein-Westfalenê di kesayetîya wan de bihêztir bikin – bêyî cudabûna ji ber welatê jê hatine, baweriya wan, an jî meyla wan ya cînsî. Ev kesayetîya taybet xwe di çandê de jî didê der. Em vê yekê dîsa zindî bikin – ew jî bi vejandineke di çandê de, piştî wê dema dijwar ya rawestandina her çalakiyekê.

## **PÊŞEROJA DEYNAN TINE.**

Kredî (deyn) di dema qeyranê de ji me re bûn alîkar. Lê di heman demê de ji me re giringiya darayîyeke bi rêk û pêk jî berbiçav kirin. Niha jî ya giring ew e ku bi lez û bez ew kredî şûnde bîn dayîn. Nabe ku deynkarî ji me re bibê edet – neviyên me naxwazin çiyayekî ji deynan weke mîrat ji wan re bê hiştin.

# JI VIR BER BI PÊŞ.

Hemû ramanên me yê ji bo pêşketineke hîn bêtir li NRW  
li vir in: [vonhieraufweiter.nrw](http://vonhieraufweiter.nrw)

## 15. GULANÊ DENGÊ XWE BIDE FDP.

### NAVÎŞAN

Demokratên Azad (FDP)  
Lîqa NRW  
Wolfgang-Döring-Haus  
Sternstraße 44  
40479 Düsseldorf

+49 (0)211 49 70 90  
nrw@fdp.de · fdp.nrw  
facebook.com/fdpnrw  
twitter.com/fdp\_nrw  
instagram.com/fdpnrw

